

# Betlaneya havînê!

**Piştî biharê cûreyek, nêzîk de hûnê ji dibistanê azad bibin. Ji bo pir kesan ew ê gelek xweş bê, lê dibe ne baş bê ji pir kesan.**

Him mezinan û him jî zarok di dema biharê de behsa Korona dikirin. Pir kes ji vîrus û enfeksiyonê ditirsîn, lê dibe ji bo tiştên din jî. Dema ku havîn tê, hemî zarok azad in. Wê demê roj ne wek her rojan e. Li vir bêtir agahdarî di derbarê vîrusa Korona de hûn ê bibînin. Û hûn ê çawa bikin ku hûn an kesên din yê ku hûn nas dikin xemgîn in.

## **Bi vî rengî vîrusên Korona dixebite**

Korona vîrusê e ku dikare bibe sedema nexweşiya Covid-19. Dibe germbûn, kûxîn, serma, êşa qirikê û navçûyin hebê. Piraniya mirovan tenê hinek nexweş dibin. Mirovên mezin û yê ku berê nexweşiyên wan hene dikarin pir nexweş bibin.

Vîrus belav dibe dema ku kes dikûxe an pozê wî diherike. Dilopên piçûk ên ku hûn nebînin dikarin li ser tiştan û mirovan bimînin.

## **Da ku hûn nexweş nebin an ku nexweşiyê belav nekin divê hûn:**

- destên xwe bi baş bişûn bi sabûnê
- kûxîn di bin milên xwe de
- destên xwe bi rûyê xwe nekin
- li mal bimînin heger hûn nexweş bin (hetta hûn piçek nexweş bin)
- gava ku hûn tandurist in: du rojên din li mal bimînin
- hevdîtin nekin bi mezinan yan bi kesên nexweş re, lê bi têlefona bi wan re denkin!

## **Der barê Peymana li ser Mafên Zarokan**

Peymana Mafên Zarokan ji sala 2020-an ve qanûnek Swêdê ye. Ew diyar dike ku mafên zarokan çi ne. Ew, di nav tiştên din de, diyar dike ku divê zarok mafên xwe zanibin. Her weha ku mafê zarokan heye ku agahiyê bigirin.

## **Heger hûn xemgîn bin - bi kesek re biaxivin**

Hûn an kesek din xemgîn an hestek ne başin? Dê û bavên xwe an bi mezinek din ê ku hûn jê bawer in biaxivin.

Heger hûn bi swêdî, îngilîzî an erebî diaxivin hûn dikarin telefon, guftûgo an e-mail bikin bi Bris re. Li wir yê mezin hene ku bi zarokan re li ser pirsgerêkan diaxifin. Heger hûn ji Bris re telefon bikin, ne hewce ye ku hûn bêjin hûn kî ne. Ne li ser têlefona wan tê xwiyar ku kî gazî kiriye. Bris tê wateya "Mafên zarokan di civakê de". Telefonên wan 116 111 hene.



Bi rêwerzkirina têlefona ber bi kodê QR bike, dibe hûn werin ser rûpelek malperê.

Karûbarên civakî(socialtjänst) yê şaredariya we dikare ji wan kesên ku di malê de pirsgerêkan hene bibin alîkar. Li ser malpera şaredariya xwe li "socialtjänst" bigerin. Bînin bîra xwe ku tu carî çastî ne yê zarokan ne heger ko halê mezinan xirabe an şaş dike.

Rêxistina Parastina Zarokan(Rädda Barnen) ji wan re appek heye hûn dikarin daxînin heger halê we ne baş bê. Jê re "Safe Place" tê gotin.